

Mafên we di lêkolînê de: Pela agahdariyab ji bo kesên ku beşdarî lêkolîna koçberiya bi zorê dibin

Beşdarbûna di projeyek lêkolînê de dihêle hûn dengê xwe bibihîzin, lê ew jî dikare acizker bibe, dem an dravê we winda bike, û/an we ji hêla laşî an giyanî ve aciz bike. Ev rûpela agahdariyan şertên sereke rave dike û mafên we diyar dike.

Razîbûna dilxwazî, agahdarî



Ev tê vê wateyê ku tenê hûn dikarin biryar bidin ka hûn dixwazin beşdarî projeyek lêkolînê bibin an na. Werin ka em vê yekê veqetînin

Dilxwazî tê vê wateyê ku hûn dikarin li gorî kêfa xwe biryar bidin - bêyî cezayê ji bo redkirina beşdarbûnê û bêyî feydeyên mezin (wek diravên zêde) bo beşdarbûnê.

- Ji ber ku hûn beşdarbûnê red dikin, hûn ji tişt an xizmetan nayên bêpar kirin.
- Tevî ku kesek, rayedarek hukûmetê an rêxistinek ji we re şîret bike ku hûn beşdarî rapirsînê bibin, hûn ne mecbûr in. Tevî ku hûn beşdar nebin, hîn jî heman xizmet û çavkanî radest we dibin.

Agahdarî ev tê vê wateyê ku mafê we heye ku hûn bizanibin lêkolîn li ser çi ye, ji we tê xwestin çi bikin, û feyde û xetereyên tevlêbûnê çi ne.

- Pêdivî ye ku hûn bipirsin ka lêkolîn çi qas dirêj dibe û ya ku we tam pêwîst e çi ye.
- Mafê we heye ku hûn zanibin ka lêkolîn çawa tê parve kirin û hûn çawa dikarin bigihîjin encamên lêkolînê.
- Mafê we heye ku hûn bi zimanek ku hûn jê fam dikin van agahiyan bistînin. Eger pêwîst be hûn dikarin wergerê devkî an werger bixwazin.
- Dibe lêkolîner agahdariyên têkiliyê ji we re radest bike ku hûn bikarin eger pirs an fikarên we hebin hûn bikarin bikar bînin. Eger hûn dixwazin paşê paşve bikşînin hûn dikarin ev agahdariyên têkiliyê bikar bînin.

© Christina Clark-Kazak, 2021. Translation by Access Alliance Language Services. CC BY-NC-SA 4.0.

Mafên we di lêkolînê de: Pela agahdariyab ji bo kesên ku beşdarî lêkolîna koçberiya bi zorê dibin

- Mafê we heye ku hûn di hertim pirsan bikin.

Razîbûn tê vê wateyê ku hûn bi eşkere qebûl dikin ku beşdarî wê bibin.

- Tu kes nikare li ser navê we razî bibe (ji xeynî biçûkên bin temenê qanûnî an mezinên ku xwedan jêhatîbûnên têgihîştî yê sînordar in; ji bo erêdaniyê li jêr binêrin).
- Bi giştî ji we tê xwestin ku hûn formek îmze bikin da ku bi fermî destnîşan bikin ku we qebûl kiriye ku hûn beşdarî rapirsiyê bibin. Mafê we heye ku hûn li ser formê bi xizm, heval, rûniştevan, endamên civatê, an kesek din re bipeyivin berî ku hûn biryar bidin ka wê îmze bikin an na. Divê lêkolîner kopiyek ji forma îmzekirî ji we re radest bikin.
- Ger hûn tercîh dikin, hûn dikarin li şûna wê razîbûna devkî bidin. Ev her gav ne mumkun e, li gorî daxwazên Desteya Exlaqî ya Lêkolînê (REB) ve girêdayî ye.¹
- Hûn dikarin hertim ji lêkolînê vekişin in - ne hewce ye ku hûn lêkolînê biqedînin. Eger hûn biryara vekişînê bidin, mafê we heye ku hûn bixwazin qet agahdariyên we bikar neyên.
- Herwusa hûn dikarin bersivdana ji hin pirsên taybetî red bikin an jî beşdarî aliyek taybetî yê lêkolînê bibin.

Erêdanî tê vê wateyê ku kesek di bin temenê qanûnî de an bi jêhatîbûnên nasnameyê yê sînordar razî dibe ku beşdar bibe. Di van rewşan de, dêûbav an sergêr jî divê bihêle ku rapirsîn bidome. Bi gotinên din, ew hem razîbûnê hem jî erêdaniyê pêwîst dike.

¹Desteya Exlaqî ya Lêkolînê (REB) komîteyek li Enstîtuya Lêkolîner e ku bi vekolîna projeyên lêkolînê re peywirdar e da ku piştrast be ku lêkolîner bi prensîbên exlaqî yê ku di vê belgeyê de hatine destnîşan kirin pabened e. Divê REB bixebite ku mafên we di lêkolînê de baştir bike.

Mafên we di lêkolînê de: Pela agahdariyab ji bo kesên ku beşdarî lêkolîna koçberiya bi zorê dibin



Mafê we yê taybetî û nepenîtiyê wê wateyê ku lêkolîner bêyî destûra weya eşkere nikare we an bersivên we di lêkolînê de eşkere bike. Tiştên ku pêwîste li ser bifikirin:

Nepenîtiyê maf e ku hûn ji her destwerdan an tevhevkirina agahdariyên xwe biparêzin.

- Mafê we heye ku lêkolîn li cîhek taybetî û ewledar pêk were, cîhek ku kesên din ne mimkûn e ku we nas bikin û bizanibin ku hûn beşdarî lêkolînê bûne.
- Mafê we heye ku hûn dixwazin di encamên lêkolînê de bêne nas kirin an na. Di hin rewşan de, dibe ku lêkolîner nikaribe navê weya rastîn bikar bîne, heta eger hûn bi eşkere bixwazin jî, ji ber ku gengaze di lêkolînê de yê din nas bikin yê ku navê wan nehatiye eşkere kirin.
- Mafê we heye ku hûn zanibin ka agahdariyên lêkolînê çawa tê bikar anîn.
- Pêdivî ye ku lêkolîner bi zelalî rave bikin ka hûn çawa dikarin bi encamên lêkolînê re nasyar bibin.

Nêpanîtiyê parastina agahdariyên kesane ye.

- Pêdivî ye ku rêyek lêkolîner hebe ku agahdariyên berhevkerî ewle bike da ku mirovên din negihîjin wan.
- Mafê we heye ku hûn bizanibin agahdariyên we dê heta kengî werin ragirtin û kî dê bigihîje wan.
- Nayê destûr dayin ku lêkolîner van agahiyan bide aliyek sêyemîn an bifroşe.
- Di hin rewşan de, dibe ku lêkolîner mecbûriyek exlaqî hebe ku agahdariyên di derbarê xwe-zirara an zirara kesên din de eşkere bike. Pêdivî ye ku forma razîbûnê sînoren bi vî rengî yê nepenîtiyê bi zelalî destnîşan bike. Eger guman we heye, bipirsin! Hevdem mafê we heye ku hûn ji bo hemî agahdariyên ku di derbarê we de hatine berhev kirin, ser nepenîtiyê israr bikin (li jêr binêrin).
- Di hin rewşan de, dibe ku rapirsîner xwediyê berpirsiyariyek qanûnî be ku çalakiya sûcarî ji polîs re ragihîne. Pêdivî ye ku forma razîbûnê sînoren bi vî

Mafên we di lêkolînê de: Pela agahdariyab ji bo kesên ku beşdarî lêkolîna koçberiya bi zorê dibin

rengî yên nepenîtiyê bi zelalî destnîşan bike. Eger guman we heye, bipirsin! Her weha mafê we heye ku hûn israr bikin ku hemî agahdariyên ku di derbarê we de hatine berhev kirin bênav bimînin.

- Dema ku hûn bersiv didin rapirsînên serhêlî, divê hûn bala xwe bidin ku her agahdariyên ku li ser serverên hin welatan, wekî Dewletên Yekbûyî, têne ragirtin, berdestê dewletê ne. Mafê we heye ku hûn bipirsin ka lêkolîner di van rewşan de mafê taybetî û nepenîtiyê çawa misoger dike.

Nenasbûn tê vê wateyê ku qet agahdariyên nasnameyê tune, ji ber vê yekê tu encamên lêkolînê yên taybetî ji kesekî re nayê şopandin.

- Ev çareseriyek e ji bo sînardarkirina nepenîtiyê ya ku me li jor behs kirî: Misogerkirina çawaniya berhevkerina agahdariyan tê vê wateyê ku kes - heta lêkolîner jî - nizane kî bi ew agahiyan ve girêdayî ye.
- Eger rewşa koçberiya we hîn neyê rêkûpêk kirin, divê hûn bipirsin ka lêkolîner çawa piştrast dikin ku agahdariyên we nenas in. Wekî din, encamên lêkolînê dibe ku we bixe xeterê.



Pabendiya lêkolîneran a ji bo negehandina zirarê tê vê wateyê ku refa, rûmet û ewlehiya we hertim tê berçav girtin.

- Eger di her qonaxek ji lêkolînê de hûn aciz bibin, mafê we heye ku hûn ji lêkolîner re bêjin.
- Eger lêkolîner berdewam we aciz dike, divê hûn ji kesê ku hûn pê bawer in re bêjin (heval, endamê malbatê, xebatkarê bajarokê, endamê civatê) û divê hûn bi lêkolîner REB re têkilî daynin. Pêdivî ye ku ev agahdariyên têkiliyê li ser forma razîbûnê were xuya kirin. Yan hûn dikarin li ser înternetê li agahiyan bigerin. Hemî zanîngeh û nexweşxane xwediyê REB an komîteyek wusa ne.
- Mafê we heye ku birêzdarî û bi şêwazekî bi we re tevbigerin ku rêz li dîroka we ya çandî, olî û etnîkî bête girtin.